

HEJMAR


31

%100  
KURDÎ

# pîne

AN ZIMAN AN NEMANI..

KOVARA QERFÎ Û WÊJEWÎ



kovara qerfî û wêjeyî ya nîv mehî 1-15 şubat (reşemî) 2001

Sayı: 31

600.000 TL

ŞERXWAZ Û XÊRNEXWAZAN BI KUŞTINA GERÎNENDEYÊ EWLEKARIYÊ YÊ AMEDÊ GAFFAR OKKAN XWESTIN  
DENGÊ AŞTIYÊ BIFETISÎNIN: LÊ HESABÊ MALÊ Û SÛKÊ LI HEV DERNEKETI!.. DENGÊ AŞTIYÊ ERD Û EZMAN ANÎ  
XWARÊ!

GUUM!...  
TEEQ!...  
TEEEQ!...

ÎCAQI BU?  
HEYRAN HINEKÎ  
REHET BISEKÎNIN.  
BILA XELK HINEKÎ BI  
AŞTIYÊ ŞA BIBE..





## DAXUYANIYA KONFERANSA BERLÎNÊ...

Gelî mêvan û beşdarên ku avê dikolin!.. Gidî-nol!.. Em belesebeb xwe diçirîn!.. Hemû we-şan û saziyên ku li ser çand û zimanê kurdî kar dikin, bigirin!.. Îca ev konferans ji ku derket!.. Jixwe mirov dikare di saetekê hînê kurdî bibe; zimanekî gelekî hêsan e!.. Wisa gotiye rojnameya **Özgür Politîkayê**, ku li Ewropayê jî bi zimanê tirkî derdikeve!.. Çendîn nûçeyekî serketî û flaş e!.. (Heyran, ku kurdî evqas hêsan e, çima stranbêj, şanoger, siyasatmedar, rojnameger û hwd.ên me ev deh sal in hînê zimanê xwe nabin. Ji serê sala 1990î ve qampanya têne gerandin, lê hê jî me ta di derziyê re nekiriye!.. Her kesî hînbûna kurdî "ertelemîşî" rojke nediyar kiriye!.. Aş çûye, em li çeqçeqokê dipirsin!..)

Va ye **Yekitiya Karsazên Kurdan** jî ava bû. Ger ew îlanên xwe yên kar bi kurdî bidin û bê-jîn, "Xebatkar û karkerên jêhatî û zana pêwîst in; ên ku bi kurdî bizanibin çêtir in." Piştî vê îlanê emê herin li mala xwe rûnin. Ma kurd çima li Stenbolê li Lalelî û Aksarayê di mehekê de hînê zimanê rûsî dibin (Lê divê mirov rola "ferhengên zêr" jî ji bîr neke!.. Ne wisa?)

Pêşniyarek din: Ji bo ku zarokên kurd bi kurdî bipeyivin, bila **KNK** şekirê qulqulî, mewjî, benî û **Pokemonan** li wan belav bike; wê bibin bil-bil! (Ezbenî!.. Berê navê zarokan ne bi kurdî bû, lê hêmuşyan bi kurdî dizanî!.. Îro bi tenê navê wan kurdî ye; ên ku bi kurdî zanin jî li saziyên me zimanê xwe ji bîr dikin!.. Tiştê herî êşdar û xemdar jî gelek zarok li ber deriyê girtîgehê zimanê xwe ji bîr dikin!..)

Li aliyê din, hûn doza standartkirina zimanê kurdî dikin. Hirç û govend!.. Ez gorî, we li ser i'ya bêkumik û bikumik bîst salan li hev nekir, îca hûn dibêjin emê zimanê kurdî yekgirtî bikin!.. Jixwe ne hewce ye mirov qala navê mehan bike!.. Her kes dibêje, "Kurdiya pîrika min rast e yanî barê êzîngê min!.." Dapîr û bapîrê wan ji zimanê we yê akademîk fêhm nakel!.. Lewre dapîra wan li **Oxfordê** li ser felsefe û etimolojîyê master kiriye!..

Ezbenî, divê hûn li vê konferansê meseleya "ker û kerr" jî safî bikin!.. Lewre zanînfiroş li her derê guhê me qul dikin; serê pêşîn vê pîrsê jî me dikin

Tiştê girîngtirîn min li dawiyê hişt!.. Ji bo stara can û malê xwe divê hûn baş guh bidin vê yekê: Dema **Samî Berbang** çû ser kursiyê, tiştên mîna qedeh, qelem, qablo li derdora wî nahe-lin. Lewre bê hemdî xwe wan diavêje derdora xwe. Hûn dikarin dest û lingê wî jî girêbidin, lê wê saziyên mafparêz we şermezar bikin. Her wiha divê hûn solên wî jî derxin. Ji ber ku cara dawîn me li dora wî tiştek nehişt, wî jî sola xwe derxist û avêt balqona **Rûhî Sû Kûltûr Merkezî**. Sol li serê keçîkekê ket; keçîk bêhiş ket. Êdî kes nawere derkeve balqonê. Lê ger hûn bîdonek dew çêkin, hûn dikarin wî aş bikin!.. Dewê xwe baş biparêzin!.. (**Ayran Canavan gelîyor!**)

Ligel silav û rêzên qehrîrîn û qerftîrîn!..

## Rîzo - Dîzo


IMAM cici



\*BERAZ (DOMUZ)

## DOZO

BİRECAN



\*ARGOYÊ DE DERSÊN ZEÎF.

## MELE

EŞREF MUMCU



## SOSRETİK

EŞREF MUMCU





Piştî ku Parlemantoya Frenseyê QIRKIRINA ERMEYAN erê kir, Tirkîyeyê dîsa dest bi protestoyên sosret kir: Hem diz e hem topiz e!..




Ji bo karsazên ku hatine girtin, avakirina girtîgehên taybet di rojevê de ye!..



GIRTIYÊN PKK'YÎ KAMPANYAYA NAVÊN KURDÎ DA DEST PÊ KIRIN!..



Li 13 zarokên, ku 11-16 salî ne, ku bi hinceta ku TÎPA F protesto kirine li Rihayê hatibû girtin, doza 5 salan cezayî tê kirin.



RTÛK'ê, ji ber ku strana gelêrî ya "ÎMRANLIM" wekî "ÎMRALIM" fêm kir, ÇAĞDAŞ RADYO, ya li Enqereyê, bo 80 rojan girt.



Sembola Berxwedana Bergamayê HOPDEDİKS BAYRAM KUZU çû rêxwet!..



Biryara li ser du polisên ku bi înfaza bêmehekeme (yargîsîz infaz) têne sÛcdarkirin, wê li gorî hewayê wê rojê bê dayin.







Napolyon çi dibêje?

Pere pere pere...

Em çi dibêjin?

Tune tune tune...

Em ji rêveberên sazî û ji belediyeyên xwe re dibêjin Napolyon wisa gotiye, ew jî ji me re dibêjin, "Napolyon gû belav kiriye!..". Rêveberên me dibêjin, "Ma di dema **Napolyon** de pereyê telefonê û kirêyê hebû? Ma di dema Napolyon de pereyê heqê rê hebû? Ma di dema wî de mesrefên dibistanê hebûn? Dibêjin; "Ku Napolyon mêr e, bila bê di saziyên me de li muhasebeyê binêre! Heke di sê mehan de dîtin nebû, emê zanibin ku kî şer e kî ji derewan têr e?"

Ev demeke dirêj e ku em dixwazin hemû karên xwe, bi awayekî ji nû ve saz bikin. Lê ez nizanîm ev xewn e yan na, êdî karsazên me jî derketin holê û gotin va ye em hatin ku hemû karên we ji nû ve saz bikin. Ya xwedê, tu mezin î! Te ev roj jî nîşanî me qûlên xwe yên belengaz da.

Her çiqas wê ji nav karsazên me **Marks, Engels, Adam Smith** û **Bill Gates**ên nû demekevin jî, em dîsa jî bêjin li ser xêrê bel..

(Her çiqas midûrê me Seyit Karabaş jî dixwest bibe **Bill Gates**ê Kurdan, lê wî ev roj nedîtin û bi hesret û kendera van rojan, mixabin û sed mixabin dest bi firaqotiyê kir.)

Wekî hûn jî dizanin, li saziyên me kî behsa pere û meş dîke, mala wî û heftê bavê wî xera dibe. Kesê ku carekê meaş û pere xwest, dev ji pere û meaşxwestinê berde, êdî nikare bi bîst û heft "**özeleştiriyân**" xwe xelas bike. Mêrik nikare kirêya xaniyê xwe bide, nikare nanê êvarê li mala xwe bipêje, yanî bi "**îman quwetî**" jiyana xwe didomîne, lê nikare ji saziya xwe pere bixwaze. Kesên ku dixwazin jî ez bêjim, "**kuçuk burjuva**", "**sağ sapma**", "**sistem özlemleri**", "**bireysellik**", êdî yên din jî hûn lê zêde bikin. Bi nanoziko, yanî bi "**îman quwetî**" merş merş!.. Lê roj tê êdî "**qontûrên**" wî/wê yên "**îman quwetiyê**" jî diqedin, neçar dimîne û diçe ji saziya ku lê dixebite pere dixwaze; êdî çi tê serê wî, em nizanin.

Ji hêla din ve jî xwedê teala ji wî/wê qûlê xwe re mesajeke dişîne û dibêje, "**Hiç kontürünüz kalmadığı için iman kuvvetiyle sürdürdüğünüz yaşamınız kesilmiştir. Lütfen en yakın zamanda imanınızı tazeleyiniz.**"

Lê êdî hemû derd û kulên me yên ji ber aboriyê, xelas dibin, lewre êdî karsazên me jî hatin ba hev û emê jî bibin xwedî polîtîkayeke aboriyê. Helbet wê banqeyên me jî çêbibin û di her warî de qredîyan bidine me jî. Bi la herkes kîsên pere yên pîrikên xwe ji bin balîfan derxe û bîne û bike xizmeta banqeyên kurdan. Helbet pirs-girêk ne tenê di saziyên me de hene, her wiha heman pirs-girêk di nav hemû civakê de jî hene.

**Wê bankeyên me jî ji bo xwe reklaman çêkin;**

"Evdirehmanbank!.. Baştîrîn qredîya qelen û keçre-vandinê di vê bankeyê de ye..."

Riya xwe bi Evdirehmanbanqê bixin, hûnê bibînin ku tiştekî bi dilê we, di vê bankeyê de helbet heye.


Hûn ji xwe re bi daweta xwe û komên **NÇM**ê kêfê bikin, bila bankeya we **Evdirehmanbanq** jî bi qertên qredîyê pirs-girêkên we yên aboriyê çareser bike. Ji kerema xwe hûn ji kêfa xwe nemînin.

Evdirehmanbank! Vî şansê xwe yê dawîn baş bi kar bînin. Ji bo kêfa qûna xwe, êdî nemînin li şûna xwe.

Lezkin! Jê nemînin. Lezkin! Nexwe ev gû bêtî we nayê xwarin."

Evdirehmanbank, oxxx çi bêhneke xweş!.."

Yarebbî tu me bistîrîne, lê xwedê bike karsazên me jî hundirê saziyên me û bankeyên me vala nekin! Lê dîsa jî li ser xêrê bel..







## Lİ HADEPÊ KURDÎ!..

Li Navenda Giştî ya HADEP'ê Serokê Giştî û Cîgirên Serokê Giştî li hev rûniştin ku biyarekê bistînin. Mijar, axaftina bi kurdî ya li navendê ye.

**Mûrat Bozlak (Qonya):** Sayin arqadaşlar, gundema me ya hiro xebardana kurmançî ye. **Azadiya Welat** me eleştirmiş dike û **Pîne** jî em hetikandine ku em tirkî qonişmiş dibin!..

**Ahmet Turk (Dêrik):** Ji min re ferq naki, ez bi kurmançî karim xwe îfade bikim. Hema, ez peyvê aqademîk nizamim. Du herfê'm henî, ew jî derhal xelas dibin. Li **Carbekir** mi xwest sîyasî bipeyivim, mîstop kir. Mecbûr mam m'qeliband tirkî.

**Ferîdûn Yazar (Ruha):** Lawo Ehmed, tu hîn nizanî bêjî **Diyarbakir**, tu dibêjî Carbekir!.. Tê çito kurmançiya aqademîk şorê bikiyî. Kekê Osman ne werga ye? Em ho tirkî nebûne, win dibên werin ho kurmançî bibin. Bira her kes li şûna xwe rûne.

**Hamîr Geylanî (Colemêrg):** Ezmanêt me xaş a. Di-bit hemû kes bi ezmanêt xo biaxifit. Werin nik min ezê kurmançiya **Mîrên Hekkarî** şanî ve bidim. Ezê dergehê edebiyata kurmançî li ber hewe wekim. Xandin û nivîsîn jî hêsan e.

**Ahmet Tûran Demîr (Sêwaz):** Arkadaşlar dedîklênîzden hiç bîrşey anlamıyorum. Bîraz Türkçe konuşsanız da bîz de anlasak. Başkan! Gündemîmîze ne zaman geleceğîz, îlanîhaye bûrada böyle otûracak miyiz. Metal işçîlerînîn grevî sözkonûsû, bîz bûrada boş boş otûrûyoruz.

**Mûrat Bozlak:** Arkadaşlar gündem gereğî konuşuyorlar...

**Nacî Kûtlay (Ağırî):** Kîm demîş boş... Pî!..! Minê kurmançî xever bida, tamam...Hevalino xebardana me ya em xeber didin, gellekî muhîm e. Waxta **İttîhad Terakkiyan** de malmezînen kurdan gedê xa ra kurdî xever didan. Pêra pêra me aha hat. Zarkî xanga min heye, cînarê xa ra kurmançî xever nade. Mij-wîrê got...



**Mehmet Metîner (Semsûr):** Arkadaşlar, ben bîr îslamci demokrat kûrt ve yazar olarak burada Partî'nî sîyasal ağırlığını önemsîyorum. Kendîmî kûrtçe îfade edemedîğîm îçîn üzgünüm. Osman arkadaşla aynı evde kalıyoruz, înşallah o bana öğretecek. Büyûk alîm **Saîdî Nûrsî** de Kûrtçeye büyük önem veriyordû.

**Kemal Pekoz (Melet):** Ezî bi xa jî kurmançî dizanim. Kurmançiya ma asîmîla bûyî. Dayk û bavkên me hev ra kurmançî qise dikir, bi me ra Tirkî!..

**Nûrhayat Altûn (Sêwaz):** Heval, bû sorûnû bîz çözemeyîz. Sorûnûn sahiplerî var, gereken yapilir. Kadın şölenîne îlişkîn hazirliklari gözden geçîrmemîz gerekmiyormûydû!..

**Osman Özçelik (Dêrik):** Ger mirov bi awayekî zanîstî û bî şêwazeke tendurîstî li ser mijara rêzîman raneweste, dê lêker û cînavk û daçek tev li hoker û rengdêran bibin. Mirov nikare rengdêrên nependî jî yê xwedanî cûda bike. Meseleya tewangê di zîmanê me de girîng e. Vêca...

**Mûrat Bozlak:** Daçekmîş, lêkermîş, cînavkmîş, hokermîş hohoo... Arkadaşlar bû gündemî bîr daha açılmamak üzere kapatıyorum.



Dawî



## NEXWEŞIYÊN CIVAKÎ!...

Van salên dawî nexweşiyên nû li civaka me peyda bûne, ku hê jî dermanê wan nehatiye dîtin. Hîpokratên nû, heger ji van nexweşiyên nû re çareseriyekê nebînin, heye ku civak li ber vîrûsên van nexweşiyên çem û çem here. Bi xêra çend nexweşên dilsoz, min li ser hinek nexweşiyên nû lêkolîn kir û di dawiyê de teşhîsên ecêb û sosret derxistin holê;

**KEDXWARÎ:** Nexweşiyêke postmodern e. Mirovê ku pê dikeve, di ser pozê xwe re li derdorê dinêre; çavsor dibe û tehb û zehmetiya tu kesî nake xema hacetê xwe jî.

**TIRALÎ:** Ev nexweşî wekî marê kor hêdî hêdî mirov dîkuje. Yê ku pê dikeve, ji hewlêdan û xîretkêşiyê dadikeve û di nav qirş û gûyên cîranan de heta mirinê digevize.

**ŞIROVEGENÎ:** Mirovên ku bi vî nexweşiyê dikevin, li ser her tiştî, baş nebaş, rast xerab 'qonişmîş' dibin. Heta derbarê nemirinê de jî fikra wan heye, lê zanîna wan qet nîn e. Xwe wekî pisporên pisporan dihesibînin û li gorî xwe 'çözümlemeya' her tiştî jî dikin.

**AQILFIROŞÎ:** Yê ku bi vî nexweşiyê dikeve, aqilê xwe û yê pîrka xwe dixê nivîst û li ser sergo û kaniyan wekî dermanê mirinê belav dike, lê ji halê xwe re duayekê jî naxwîne. Ji heval û hogirên xwe re masîgir e, lê ji xwe re ne kûsîgir e.

**MURÎDÎTÎ:** Nexweşiya herî bêderman ev e. Yê ku pê dikeve, heta dawîya emrê xwe di nav pêlavên axa, şêx, beg û tirtireyan de dimîne; Li kuçeyên zaboq li xelasbûna xwe digere.

**REXNEKUJÎ:** Ev nexweşî, dişibe nexweşiya nêçîrvanan. Yê ku pê dikeve, piştî kedeke mezin pêşî kêmasiyên nêçîra xwe "yaqalamîş" dike û dû re wan peyvên ku ji berê de amade kiribûn, wekî tîrên tûj li ser hev lê dibarîne. *(Dibe ku tîrêkê li vî nivîsê jî bibarîne...)*

**AŞBETALÎ:** Yê ku bi vî nexweşiyê dikeve, tiliyêke xwe dixê nav gotinên xelkê, yekê jî dixê dereke xwe. Ji ber xeberdana zêde ziman kul dibe, lêv dîtîkin, çav zer dibin û keşîl (girêz) ji dev tê.

**ÇAVNEBARÎ:** Li gorî Celadet Bedirxan kelema li ber pêşveçûna mirovatîyê ya herî mezin ev nexweşî ye. Yê ku pê dikeve, bîst û çar saetan hem li dora qûna xwe dizivire û hem jî sîxîkekî (şivik) dixê, nav hemû xweşî, başî, serketin, guhartin û pêşketinan.

**KARÎZMAFIROŞÎ:** Ango navfiroşî. Yê ku bi vî nexweşiyê dikeve, hemû kar û barê xwe bo pesandinekê dimeşîne. Gavavêtin û serkeftinên xwe li ser hebûna hinek mirovan saz dike. Ji bo van tiştan qul bi qul, welat bi welat digere, lê dîsa jî bi ser nakeve.

**BARGIRANÎ:** Ev nexweşî ya maceraperestan e. Yê ku pê dikeve, xwe *Robin Hoodê Modern* dihesibîne. Bo rîzgarî û xelasbûnê formûlên xwe pêşkêş dike û doza dîn û îmanê jî dike. Lê ya rastî pêşiya her kesî digire û nikare bibê destbivir jî.

**ŞEKL û ŞEMALÎ:** Yê ku bi vî nexweşiyê dikeve, li gorî dîtin û gotinên neqîşandî tevdiqere. Hemû tiştê xwe li gorî rojavayê diguherîne, lê mêjiyê xwe naguherîne. Peyv û têgihên nenas bi kar tîne û rêbazên filozofên mezin dubare dike, lê wekî morîstanekê (gêrik) jî tu gavan navêje.

**TIRTIRETÎ:** Li ser vî nexweşiyê, heta hîlbijartîneke nû wê lêkolîn bidomin.

**PAŞGOTINÎ:** Nexweşiya herî tamdar, lê ewqas jî malkambax ev e. Yê ku pê dikeve, ji ber ku ji felsefeya zanîne bêpar e, felsefeya gotegotan çêdike û wekî ayetên pêxemberan li civakê belav dike.


**QURETÎ:** Yê ku bi vî nexweşiyê dikeve, malwêran dibe. Xwe wekî axayê şêst-gundan mezin û mîna qaziyê deh paytextan babegît dibîne. Ji ber nefsa mezin, têkiliya hemû mirovan jê tê birîn.

**TEORÎFROŞÎ:** Ji ber teoriyên sîfto û genî, min nekarî ez nêzî vî nexweşiyê bibim.


**EVDÎLE KOÇER**

## ŞEKIRÊ QULQULÎ

CEM ŞEKER







## DOMANÎ

Hêwî gurenê domanî tersenê.  
Şiliyê varena domanî benê hî...

Na welatê ma dê no senên tertelewo kê se beno, bibo qudumê xo yeno domanan ser.

Vêsan manenê...

Têsan manenê...

Vîndî benê...

Mirenê...

Heq se keno, ma se kenîmê?

Ma dewletê se kena?

Domananê xo rê wayîr nêvêcînî-mê; vêsaniya, têsaniya, vîndîbiyayîna, merdena înan dê pêyniyê dê binê ma kinîno.

Çi kê; înay mabenê ma dê, vîmiya çîmanê ma dê perîşan benê, vîndî benê sonê, virêndiya (pêşeroj) ma nêmaneno.

Heq ra têpiya; dewletê kî, destê xo ma ra rêw cena pê.

Dewletê zulim kena, heq hênî ser keno cor ra.

Heq ser keno, ma ser kenîmê. Dewletê zulim kena, tertele kena, kîsena...

Nî rocan dê welatê ma dê ancî domanî talan benê...

Rocê, *Suka Wêranşar* dê vengê domanan bimayî. Dimê ra *Amed* dê kerdî zere, fîfî darê...

Bîmayena vengê domanan nêwe niyo welatê ma dê. Çend seriyo kê niyawo. Sanayî qersûnan ver, eşî vîmiya lasêran...

Bîne banan dê mendî, wertê adîran dê mendî, vêsayî...

Bado se bî?

Se bî ma rê bî...

Çi kê; domanî mayî mê, ma domanî mê...

Înan rê se beno ma rê beno...

Mexeletiyê!

Ma rê beno!

Na ra tepiya teyna meverdî mê domananê xo, wayîr bivêcîmê.

Destê zulimî ra, destê merdenê ra bicerîmê.

Rindekiya domanan ze rindekiya çiçegan a.

Rindekiya çiçegan kî, zê domanan o.

Hama payîz kê ama çiçegî benê husk.

Domanî husk mebê rê, meverdî mê.

Peşew û peroc biqirîmê:

"Domanî..


Domanî...

Domanî... Domanî her çiyê ma yê..."

# ax îdeolojiya min ya resmî a ax!!







## GIRARA QERECIYAN

### GIRARA TÊR XWEZÎ!..

Li Sûrtiyeyê, piştî lîseyê, her xwendekar, li gorî puwanên (not) xwe, ji kompîtûrê re pazdeh xwestekan datîne; kompîtûr ji li gorî rewşa wî û ya zanîngehê beşekê jê re bîldibijêre.

Pîşka min li biqûqê ketibû. Lê ya bevalekî min, navê wî Mecîd bû, li endazyariya (hendese) mekanîk ketibû. Mecîd nû ji gundekî li dora Qamişloyê hatibû. Rihê wî, dîn û îmana wî, bi pêz ve bû; hemû serpehatî û gotinên wî, xem û xeyalên wî li ser pêz bûn.

Carna li dawîya şevê, xwe li ser piştê radimîdand û bi dengêkî, bilind û dirêj û qebe bang dikir: "Mecooo... Kuro pez werin pez!.." Wîba

bi vê peyvê wî re xwe û piştê axî an jî diken.

Mecîdê de diçû gundekî min tim ji ket û bi sê min dikir, bibim ser pez ji nişka Me pez ajokirtekirta xwar û heyvê yekê, yekî, me berda êê!... Her me av vexwar, bû def. Bi pez bir loyan pe tin. Wê xweş bû. mesrefa min nê bi bavê me

Mecîdê mî sên fakûlteya, bi bavê yivî, gazinc

## TABLÊTÊN





êz ya da-  
ir diêşand  
k dikişand

eyala xwe

d: "Bavê

girê dadi-

ngan gazî

ku ez pêz

ê. Rojekê,

buba bû.

r xwê. Bû

ezî û xwê

var!... Piştî

r, ew pezê

er avê. Hê-

tenekeyek

ik li wan

awayî me

û bi kî-

bate firo-

me me pîr

ba jî beqê

ya xwendî-

n re nîn e."

her jî der-

ê vedigeri-

awe re dipe-


dikir: "Ya-

bol.. Ma ez ê van deran  
bûm!.. Yabo!.. Ma ez ê  
mîkanîk bûm yabo? Ma  
ez ê zanîngeh û manîng-  
gehê bûm? Ma çi beqê te  
li min hebû, ku te ez xis-  
tim vî balî? Xwezî ez li  
ber pezê xwe mabûma.  
Miha şigêr, beranê kej,  
kerê rewan û boz, ku di-  
da çar gavê. Û Meco pez  
werîn peez!.."

Meco her ku keçikeke  
xweşik û nîwtazî, pîrût û  
çîmrût û libevhatî didît  
û nikaribû xwe bigihan-  
dayê, kesereke kûr diki-  
şand û digot: "Aaaxx!..  
Xwezî bavê min, li  
gund, ez li ser kerekê bi-  
biştam û ez nebatama  
van deran!.."

Vêca, gava em li xwe  
mîkur bîn, wê ev xwezi-  
ya Mecîdo ji me bi kê re  
çênebûbe? Ez bi xwe di-  
karim berî her kesî bê-  
jim: Her ku li rewşa ni-  
vîskariya kurdî dinê-  
rim, ev xwezî xwe berdi-  
de dilê min. Lê kes bi  
xweziya nagihê cotê ke-  
ziya!..

## BEREDAYÎ









LI SER PIRTÛKA SEYFÎ QÛNMEZIN ÇEND REXNE HATIN DESTÊ ME. ME JÎ BERSIVA WAN, JI MAMOSTE Û HUNERMENDÊ TAM OTOMATÎK SEYFÎ HEVAL RE HIŞT: SILAV Û HURMET Û HURMET Û HWD. PÊŞI EZ WE PASPAS DIKIM. DÛ RE DIALÊSIM. ERÊ HATE GUHÊ MIN JÎ KU HINEK YAWSAX QÛNA WAN DIXURE KU PIRTÛKA MIN A PÎROZ REXNE DIKIN. JI NIVÎSÊ MIN ZÊDETIR LI SER PAŞ NAVÊ MIN YOXINLAŞMÎŞ. DIBIN KU PIR ŞERM E. NA QÛNA WÎ MEZINE, NA GILOVER E KA EZ ÊDÎ BÊJIM ÇI? YÊ KU PIRTÛKÊ REXNE MEXNE BIKE KERÊ DINYA ALEMÊ LI DIYA WAN SIWAR BIBE. SIPAS-MIPASI!..













# Çima?



## KESERVEDANA HELBESTÊ

Pencereya Peyvê

ahmad.hussayni@nefel.com



EHMED HUSEYNÎ

Di birêveçûna xwe ya dîrokî de, helbesta kurdî gencîneya serêkî û bingehîn a ronîkirina rabûn û rûniştin, dan û standin, awayên têramandin û hizir û bawerî û gêwil (moral) û rengên geşbûna kesayetiya mirovê kurd e.

Qonaxên jiyana gelê kurd ên dîrokî û civakî û aborî û derûnî û piraniya îstgehên kevnar ên şaristaniya wî, bi giştî, di naveroka helbestê de hatine destnîşankirin.

Di gel ku çanda me, regezên hişmendî û asoyên afirandin û derbirîn û dahênana me, bi sedê salan di prosesa xwedûbarekirinê de jiyaye û di gel ku helbesta kurdî bi sedê salan di koşeyên feqe û sofîyan de bi cih bûbû jî, dîsa, em dikarin bibêjin ku mîrata helbestî ya gelê kurd, îro ro, bersiva pirsên nasname û kesayetiya wî ya neteweyî dide.

Di çarçeweya babetên wêjeyî de, helbest, çinkî bi zimanê neteweyî ve girêdayîye; babetek e regezperest e. Lewre ji bo nivîsandina helbestê hest û nestên zelal û bişaftî gerek in. Zêftkirina kûrahiya zimên û bişaftina di ango û amaje û sîber û naveroka peyv û bêje û galgalan de, gerek in.

Îca piştî herifandin û wêrankirina hestên rewşenbîrên kurd, piştî xwendina bi zimanên biyaniyan û piştî hewldanên hovane yên gemkirin û qedexekirina zimanê kurdî û piştî çend sedsalên dijwar ku giyanê mirovê kurd di laşekî biyanî de perwerde bûye û hê jî perwerde dibe, û piştî vê sosreta şaristanî û vê qonaxa ku em bi kotekî ji zimanê me bi dûrxistine, piştî wê, dê helbesta kurdî çi be? Dê helbestvanê kurd kî be û ji ku hatibe? Herwiha alavên derbirîna vê helbestê dê çawan peyda bibin, ji kuderê, bi çi awayî û dê çilo bin?

Bêguman, çend ezmûneyên helbestiyane, ku îro li reng didin, wek serencama qonaxekê, dikarin bi pêş kevin û bigihêjin asta afirandina deqekî resen, û hêdî hêdî dîmenên nexşeya helbesta kurdî ya dawîya sedsala bîstan, nîgar bikin. Lê her û her dê sîmayên giştî yên helbesta zimanên dibistanê di warê huner û teknîka helbestê de, desthilat bin. Hewldana xwerizgarkirina ji bandora vê desthilatiyê, ji bo avakirina bingeha helbesta kurdî, dikare bibe pileya pêşîn a damezirandina cîhana rastîn a peyva kurdî; wek peyveke zelal û petî, ku ji pêşerojê û ji nav cergê keleşpor û mîrata kurdî diherike û bi xwebawerî aniha wê mîratê, wê keleşporê di şêwe û naveroka xwe de berceste dike, da ku bi hêztir, ber bi paşerojê ve, rakêşe.

Di gel hemû kêmasî, tevlihevî û çewtiyan jî, di gel hemû barûdox û asteng û aloziyan jî, helbestvanên kurd, beriya her kesî, ji ber gelek sedeman, vexwendîne ku guhertinekê di laş û giyanê kurmanciyê de pêk bînin.

Ev guhertin jî nêzîktir dibe, dema ku helbestvanê kurd, bi şarezayî, bişê, hest û nestên xwe ji şûnşopa zimanê dagirkeran rizgar bike, li mîrata kurdî vegere û giyanê xwe, ji nû ve, bi peyva kurdî av bide.





## namedank!...

### Ji bo Pîneçiyên Çend Pêşniyar

1- Têkiliyên xwe yên aborî, siyasî û civa-kî ji hemû kesên ku Pîneyê naxwînin, bibirin. Kî dizane belkî îmana wan bê serê wan!..

2- Dev ji rexneyan berdin. Bikevin hundirê malê û li ser navê "**Komara Demokrîtîk**" sond bixwin, da ku hûn nameyan ji Pîneyê re bişînin.

3- Wekî berê Pîneyê bistînin, bixwînin, lê negerînin. Ji ber ku "**aynasizlari**" der û dor li me girtiye!..

4- Ger hûn dixwazin bizanin ku **Sêla Sor** çawa sor dibe, bernameya Cahîr Abê temase bikin.

5- Ji yara xwe re "**Kilamên Yêrîwanê**" bistîrên, da ku tîraja wan qasêtan zêde bibe.

6- Qet nebêjin "**Bijî yekîtiya kurdên OHAL U BUHALÊ û yên derveyî OHALÊ û BUHALÊ!**" Paşê kî wê şerê birakujîyê bike!

7- A herî girîng helbestên **Cigerxwîn** nexwînin. Ma cigerê we ji bixwîn bikeve çêtir e!

8- Qala "**aştîyê**" û "**rojîya mirinê**" nekin. Haya we ji **Tîpa F** heye an na!

9- Dema ku hûn mecbûr man derkevin derveyî welêt, neçin Parîsê. Xwedê we ji aqûbeta miriyan dûr bihêle.

10- A dawîn, ji xeynî Pîneyê tu kovar u pirtûkên bi kurdî nexwînin.

ORHAN ZÎNAR

### LI XERÎBIYÊ PÎNE ZAF XWÊŞ E!..

Em temamê hejmarên Pîneyê bi malbatî dixwînin. Em bi Pîneyê serbilind in. Ez keçeke kurd î 13 salî me. Bi eslê xwe ji **Batmanê** gundê Biledêrê me. Niha ez li Elmanyayê li bajarê **Celle** dijîm. Li xerîbiyê Pîne zaf xweş e!..

### ŞERÊ PÎNECÎ Û PAPARAZÎCIYAN!..

- Oxlîm Reşo!.. Ka Paparaziyan açmîş bike, em "**Nêremî Nêremî**" sêr bikin.

- Bavo ma îca dayê!..

- De biqêşite têdehato!.. Ma qey ez têra bavê te nakim. Ma çi yê min ji **Banû Alkanê** kêmtir e?

- Zilliyet, Ziriyet, Virdîkal!.. (Zarokê malê rojnameyên bi tirkî dixwînin!..)

- Teq teq!..

- Tu kî yî?

- Ez im Pîneçî!..

- Kuro zû "**Nêremî Nêremî**" bigirin!.. Hevalê **Pîneçî** hat, eyb e!..

Zû bibin ser Medya TV!.. Xwedê nehiştîno zû bibin ser **Medya TV**!..


Xwelîsemo hûn jî zû wan rojnameyên tirkî veşêrin, **Pîne û Azadiya Welat** bixwînin!..

- Hawara xwedê!.. Wê agir di ser serê me de bibare!.. Em di bin vê baran û teyrokê de, bi heft kul û belayê, Pîneyê belav dikin. Ev dilkevir Virdîkal, Ziriyet nizamim çi quzilqurtê dixwînin!.. Bi xwedê wê qiyamet rabe!..

SAÎT DEGER

"Heyran her bijî ji we re!.. Mala we ava, tîjî bûk û zava!.. Va ye wisa binivîsin!.. (Îste okuycu îste mektup!..) Bêhenek tûrikê we tîjî ye!.. Hinekî zorê bidin xwe, wê xelk ziko piştî bibe!.. Ji anketên we diyar bû ku hûn jêhatî ne, lê tiral û sersar in!.. Ji me jî xerabtir in!..

## XAÇETERS



1- 4'ê reşemiyê wê bikeve 5 saliya xwe. Li bakurê welêt dil, çav û guhê ziman û çanda kurdî yel.. Neviyê **Welat** û **Welatê Me** yel.. Bi tenê paşnavê wê binivîsin - Hin ji ber sermayê hin jî ji ber evîne pê dikevin 2- Êdî ewqas dijiwar û zehmet bûye ku zarokên malê jî kar dikin; debar. - Guhên mirovê bi meraq û zikrêş tim wisa ye. 3- Dema dê û bav li zarokan dixin ev deng derdikeve; ne şîrîn e (**Destê we bişkên û tiliyên we biwe-**

**rimin!**. Zarokno hûn dikarin telefonî Pîneyê bikin; emê alîkariya we bikin!..) -

Ew belqitiyê yezdanê misrî; em dikin nakin jê xelas nabin. 4- Heyran, di gelek xaçepirsan de dibêje, di zimanê kevn de gor û tîrb e. 5- Di vê demê de gelekî bi pêş ketiye; yên gundî hebûn, niha jî yê bajarî peyda bûne; qumazî. 6- Navê straneke **Koma Kizilirmak**; hema bêje navê qod yê komê yel.. - Hin kes jî jê re dibêjin xwelî!.. (**Yê/a ku nizanibe xwelî li ser bel**) 7- Peyveke bi talûke yel.. Dibe ku RTÜK'a me jî aciz bibe. Hin kes jî jê re dibêjin deşta bin doxînê!.. Ango herêmên stratejîk!.. - Her çend heywanekî baş û dilsoz be jî, ji ber bêbextî û bînamûsiya mirovan navê wî xera bûye. Bîndest jî ji bo ku axa û patronê di nav dilê xwe de aş û tîr bikin, xwedî dikin!.. 8- Piştî **Cotarelli** derman nivîsand, qet nayê peydakirin; yê/a ku peyda dike jî, jixwe tê avêtin. - **Metropol Çocukları** vê pîrê nizanin!.. Otel û Pansiyona pez û dewaran; cama jî karê "noqte sor" lê tê kirin.

★ ★ ★

1- Mala bar kir çûne... - Berê piyaseya keç û xortan bû; li vir hevdu didîtin (**Keç û xort berê diçûn ser vir, îro jî diçûn ser saziyê!**) 2- Di destana **Memê Alan** de navê pêxwas û qirixê me. Ma ji we kirî tarîxa qirixan nîn e!.. (**Ne diyonûz lan oxlîmîn oxlîs!**) 3- Ku hûn mîr û jin bin vê pîrê bizanibin!.. Navê devyê nêr!.. - Îmana femînîstan ji vê peyvê diçe; berevajî mê. 4- Ku hûn mîr, jin, kur, keç û zarok bin vê pîrê bizanin!.. Bi tenê hûn dikarin ji Ferhengê **Bîrêz Îzolî** vê peyvê peyda bikin. Ji mîrên jînoke re tê gotin; yanî eîşgulê, nonoş. - Va ye dîsa pîrseke dîrokî û bi talûke. Yê ku dixurifin û çelq dibin, pê dilîzin; ji zotikê derdikeve; panî pîsî. (berepas) 5- Li qeraxa behrê zerî û dîlber xwe didin ber û diqemirin (**Hûn lê dinîhêrin hêç û hilorî nol**) 6- Yek ji xwarinên neteweyî û mîlî yên kurdan. Dotmama pîvazê (**Ji kerema xwe re diranê xwe bişon!**) 7- Şahidê rovî kî ye? Yê/a ku nizanibe ne kurd e bi Xwedê û Quran!.. - Jixwe kurd navê kesî tam nabêjin. Kurtêya Îsmail. 8- Bi xwedê bêhemdî me ev peyv dikeve xaçetersê. Me jî fêhm nekir, çawa çêdibe; ji neçariyê dikevê. Yê/a ku ji eşîra Alan e. (**Bi xwedê em pereyê reklamê ji we dixwazin!**) - Cînavkeç; yanî mîna ez, tu, wan, hûn...

### PEYVA ÎLLEGAL

Deh kesê ku peyva îlegal bibînin û bişînin ser navnîsana Pîneyê, wê kasete **KOMA AGIRI HEWLER** qezenc bikin.

Kesên ku peyva îlegal "**ŞEKİR**" dîtin û kasete **HOZANÊN XORASANÊ** qezenc kirine ev in: **Murat Durgun**/Antalya, **Mehmet Kurtoğlu**/Qoser, **Elif Yiğit**/İzmit, **Devrim Doğan**/Batman, **Özgür Baran**/Batman, **Hikmet Xwerist**/Sêrt

## Ji Weşanên Welat bixwazin

#### Amed

Kıbrıs Cad. Türk Hava Kurumu Apt.  
Kat 4. Tel: 412 223 34 83

#### Wan

Belediye İş Merkezi  
Kat 1. D 106  
Tel: 0432 215 64 26

#### Batman

Yeni Mah. 711.Sok.  
No: 27 Kat 2  
Tel: 0 535 319 46 15

#### Riha

Kunduracılar Pazarı. Özpolat İşhanı. Kat 3/5  
Tel: 0414 216 81 07

#### Edene

Kocavezir Mah.  
Karacaoğlan Cad.  
Aziz Pamukçu İş Merkezi  
Kat 3. No: 23  
Tel: 322 351 42 78


#### İzmit

1420 Sok. Koyuncular  
Apt. No. 12. Kat 5.D.5  
Kahramanlar  
Tel: 232 446 19 50

#### Mersin

Çankaya Mah. 4709 Sok. Eser İşhanı Kat 1.D. 5  
Tel: (0324) 237 66 49

**Kerem  
kin, li  
axaftina  
Serok û  
Sokrates  
guhdarî  
bikin!..**



**DERKET**

### Kovara panzderojî (Onbeşgünlük Dergi)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi) **M. Nuri Karakoyun**  
■ Koordinasyon Giştî: **Sami Tan**  
■ Lijneya Weşanê (Yayın Kurulu):  
**Mazlûm Doğan, Doğan Güzeli, İmam Cici**

■ Berpirsiyarê Karê Nivîsaran  
■ (Yazı İşleri Müdürlü) **Abdurrahman Pekedis**  
■ Navnîşan (Yönetim Yeri) **İstiklal Cad. Ayhan**  
**İşık sokak 19/1 Beyoğlu/İstanbul**

■ Tel: (212) 292 72 70  
■ Fax: (212) 251 95 85  
■ E-Mail: [pinedank@hotmail.com](mailto:pinedank@hotmail.com)  
■ Kargert (İdare) (212) 251 79 37

■ Çapxane: **Aspaş Matbaacılık**  
■ Yayın Koordinasyonu  
**Ada Basın ve Yayıncılık San. Tic. A.Ş.**  
■ Belavîdîrîn **BİRYAY** Dağıtım

■ Nûnergeh: Edene: (322) 351 42 78  
■ İzmit: (232) 446 19 50 Mersin: (324) 237 66 49



## BEQ Ên destê sibê hatine dinyê



Gelî hevalên nefsiroş!... Em zanin gotina me beredayî ye, lê dîsa jî emê bibêjin (*Heta ku pozê we bişewitê!*) Nefsa we ya mezin, dibe belaya serê we. Hûn dixwazin li saziyê her kes qala we bike, li gorî perspektîf û pêşniyarên we bifiroşel! Ev jî têra we nake; hûn dixwazin tevgirêdan, ken û girîna wan jî li gorî we be. Ma wisa çêdibe çavê min!...

## QUŞXANE Ên berî nivro...



Hûn gelek caran henekên çirto virtodikin û dibêjin, "Yabancı dilim Türkçedir!" Ulan qebraxler, hûn heta êvarî bi tirkî "qonîsmîs" dibin û jî bo zimanê tirkî peyven nû diafirînin (*Ma ne rast e!*) Dema ku hûn du-sê caran bi kurdî bipeyivin, çawa ku hûn mineta xwe li bavê me bi-kin (*Welleh rast e heval!*) Em li vir îlan dikin: Yabancı diliniz Türkçedir!... (*Heta ku hûn jî zimanê xwe hez nekin, wê destê me li ser stûyê we bel!*)

## MOZ Ên piştî dana pez



Bi şev û roj çavên wê li ser wê nel... ji merqeya berbiska bigire heya nimro-ya pêlavê wê, hûn her tiştê wê zanin. Ji ber evîna we, we çend çarîn jî nivîsandine (*Merheba ji Xeyamên nû re!*) Lê hûn dikin nakin nikarin dile xwe jê re vekin!... Qet netirsîn, ew jî li ser we dişewite û heta navê pînka we jî hîn bûye (Ê daha okuyunuz evindartır!)

## CAŞIK Ên ber êvarê...



Rojekê, ew hevalên ku zirt û pesna we didan, wê êdî çêr, nifir û kevir û kuçan li we bi-barînin. Ew hezkiriyên ku barweriya we pê dihat, wê êdî di civînên resmî de jî navê we reş bicivînin. Roja mêr û mênariyê, jin û jinaniya hingê ye!... Lê hûn anihî jî tevdirên xwe bistînin!...

## ZIRNE Ên nivê şevê...



Hûn bêhemdî xwe ketin nava siyasetê û qasê hûn bi siyasetmedarên tirkî re qayîsê dikînin!... Ha ya we ne jî bayê felekê, ne jî çand û zimanê kurdî heye, jixwe kovar û rojnameyên kurdî ne xema we ne; hûn qet naxwînin. Meyê qala dek û dolabên neviyên Osmanîyan bikirî; lê em serê we neşînin... (*Xwedê dizane, hûn niha kîjan nifiran li me dibarînin!*)

## HUDHUK Ên heft mehi hatine...



Hevalê delal û derdgiran!... Hûn mirovekî bejî ne. Heta ku mirov bi we re nedin û nestînin û nebêjin, quzilqurt, hûn qûna xwe jî nazivînin!... Hûn heta êvarê di ser eşîr û terîqeta xwe de dizivirin û wekî qadiyê bajêr her kesî "yargilamîs" dikin. Dema hûn li derve aciz dibin, hûn bi jin û zarokên xwe re şer dikin (*Xwedê ya xerabtir bîne serê wel...*)

# DIYALOGÊN SIST <sup>Şeref</sup> MUMCU



- YAW BOZO ABÊ XWEDÊ JI DÊ Û BAVÊ TE RAZÎ BEL. BI CIXAREYA TE YA DO, LINGÊ MIN ERD NEGIRTINI. WEKÎ KEVOKÊN TEQLEÇÎ MIN TEQLE AVÊTIN. EZ BÛM MESÎHÎ. HINDIK MABÛ BIGHÊJIM EZMANÊ HEFTAN.

- OXLM KA KÎNGÊ BOZA ABÊ LI CEM XWE CIXAREYA XERAB GERANDIYE! WEXTA XEWNÊN KU EZ PIŞTÎ CIXAREYÊ DIBÎNIM BIKIM FÎLM, BI TELAQ WÊ 30 XELATAN BISTÎNE Û LI HER WELATÎ REKORAN LI SER HEV SIWAR BIKE!

- ABÊ EZ JÎ DI XEWNA XWE DE HELBESTAN DINIVÎSIM. WELLEH HELBESTÊN NERÛDA LI CEM YÊN MIN GÛ XWARIYE. KA EZ YEKÊ JI ABÊYÊ XWE YÊ SATOR PÊXEMBERÎ RE PÊŞKÊŞ BIKIM: ŞEV BÛ, TARÎ BÛ, KÛÇE JI MIROVAN XALÎ BÛ

GILOVER MISTO BI KERÊ RE ŞA DIBÛ LÊ XWEDIYÊ KERÊ DI PÛSÛYÊ DE BÛ ERÊ MISTO ERÊ TE XWAR XIRÊ KERÊ

- LAW ETÎLER YÛMÛŞAXÎ QALAMIŞ YAWŞAXÎ, QARAKÖY QEBRAXÎ CIXARE YAPRAXÎ, TU VAN HELBESTAN JI QÛNÊ DIAVÊJÎL. QÛNA TE EWOQAS ÎLHAMÊ JI KU DISTÎNE! BI HEZARAN HELBESTÊN TE YÊN BEREDAYÎ HENEL. EV QÛNA TE QET NAWESTÊ! TU QÛNA XWE LI KU ŞARZ DIKÎ! BI RASTÎ 1000 ŞARZ JÎ TÊRA VÊ QÛNÊ NAKINI. OXLM SERÊ MIN PA-

RÎKÎ GERM BÛL. DEV JI LEQELEQÊ BERDE KILAMEKÊ BÊJEL.

- OHUI! UHUI! KUXKUX!

BÛ AXŞAAAM, BÛTÛN KEXXANERÎ DO-LAŞTÎM ÎSTANBÛL'ÎN

SENÎ ÇÎK YAPTIM KADEHLERDEKÎ DÛDAX ÎZLERINDEN

- YA HEWLE OXLM BI NAMÛS KER JÎ JI TE XWEŞTIR DIZIRIN LO! TE GUHÊ MIN ÎNFLAQ KIRIN. VA YE DÛMAN JI GUHÊ MIN DIKÎSEL. MIN JI DESTÊ POLÊSAN JÎ EVOQAS ÎŞKENCE NEDÎTÎBÛ WELLEH!

- Ê WELLEH TU ÊDÎ MIN QISKANMÎŞ DI-KÎ LO!... RESMEN BELGELENMÎŞ BÛ!

- EYIPTIR SÖYLEMESÎ, EZÊ BIKUTIM TE HAL.

- ABÊ MIN GUNEH E!... EZ 5 WEXT NIMÊJÊ DIKIMI!

- 5 WEXT NIMÊJÎL ERRIKÎ. KURO TU ŞEYTAN JÎ TE QEBÛL NAKEL.

- ABÊ EZ QET YAQÎŞTIRMÎŞÎ TE NAKIM VAN GOTINANI!... KA EZ KEVIR DIAVÊJIM TE?

- OXLM VAN CIXAREYAN EM TEVI-ZANDINEL. LI KÊFA XWE BINÊREL PEYVA BI CIXAREYÊ LI BA XWEDÊ NAYÊ NÎMSANDINI. JIXWE BAVÊ MIN MELE YE. LI BA XWEDÊ TORPÎLA MIN HEYEL.

## QASETA OSMAN QOLEKŞIN PÎPIL DERKETI

A-

1- MIN BI RÊX Û GÛYÊ GUNDÊ MIN BIŞON.

2- NATALIYA KETE JIYANA MIN,

JINÊ BI DARA PEY MIN KET

3- MALÊ DINÊ NAXWAZIM

ŞÛŞEYK ŞERAB, 20 XIRAM

PENÎR BEŞÎ MIN E. (KLAMA

GOVENDÊ)

4- WAN LÊVÊN SOR, ÇÎMÊ TAZÎ

WEY LOLO, PEHE LOLO!... HEY-

WAN LOLO QÛŞXANE LOLO!

B

1- AGIR KETIYE ZOTIKA MIN EMAN YEMAN

2- YARÊ JI MIN RE GOT

YÛMÛŞAX, MIN DEV Û POZÊ

WÊ ŞIKAND. PAŞÊ POŞMAN

BÛM. DI ŞEVEK TARÎ DE.


3- MIN LI BA ZEYNO TIREK

SOSRET KIR, ÊDÎ ŞERM DIKIM

HERIM BA WÊ.

4- ÇIYAYÊ QEREJDAXÊ BI CINA-

BET E.



ENSTURMAN

QÛŞXANE : BEYTÛLLAH

ŞEMPAZE

KEVÇÎ : HARÛN GILOVER

TENEKE : HEYDER

NAVRANGUZEL

SATIL : ÎSA QILOZET



